Hejmara - 208

# MIZGÎN

( 15 - Pûşper - 2026 )

Bê dirave



# Naverok


**Weşan**
Sûzan Elî

**Amadekirina Naverokê**
Amir Ferso

**Dîzayn**
Mecid Alsadûn

**Şêwekar**
Xalid Bîco
Rojhilat

**Werger û sererastkirina Kurdî**
Esma Mistefa
Mihemed Xanim

**Sererastkirina Erebî**
Abdulah Rehîl



1 Wênesazî
2 Wêjeya Zarokan
3 Lîsk
4 Welatê me
5 Tu dizanî
6 Tendirustî
7 Tîp û gotin
8 Navdar
9 Bexçeyê Navan
10 Jîngeh mala me ye
11 Jêhatiyên Zarokan
12 çîrok
16 Bixwînin û fêr bibin
17 Çavika Mizgîn



Kovara Mazgîn
Kovara Mazgîn مجلة مزكين

## Çivîkê weke ku di wêneyê de ye rengîn bike

## لوِّنْ العصفور كما في الرَّسمِ المُرفقِ.



# DÎKIL



Dîk û dîk dîklan û dîk e
Kumbirê dîkil şahîk e

Dîkê me qîqlan qîq e
Mam rûvî didan disîqe

Dîkê sor nikul bi sîr e
Şer û cengê de çi jîr e

Mirîşk û mamir li dorê
Ji keyfa dil jê diborê

Şîva dîk hêkê qelandî
Mirîşkê jê re kelandî


Dîkê reş melak bê şaş e
Bang dide birtî belaş e

Dîkê sor nikul çilak e
Meydana cengê de çak e

Rûvî hat gundê Bilîsê
Keleşêr mal de dilîsê

Keleşêr basik weşandin
Mirîşk û mamir meşandin


**Diyar Bohtî**



**Çargoşeyên vala bi şiklê wenda temam bikin.**

**أَكْمِلْ المُرَبَّعَاتِ الفَارغةَ بالشَّكلِ النَّاقِصِ.**



# Bajarê Batmanê

# مدينة باتمان

Li Bakurê Kurdistanê di nava deşt û çiyayan dikeve, li nêzî çemê Dîcle ya bi heybet, û li nêzî wê keleha Hesen Kêfê ya kevnar heye. Erdên derdora Batmanê deşt û berfirehin ku ji çandiniyê re gelek guncaw in; cotkar tê de: Genim, ceh û pembû diçînin, herwiha tê de baxçeyên hinar, hejîr û tirî hene, di deştên nêz de, kêvroşkên colber, gur û xezal hene.
Zarok ji gera ber çemê Dîcleyê, lîstina di nava parkan de û serlêdana cihên dîrokî bi dibistanên xwe re, hez dikin. Tê de şahiyên gelêrî bi muzîka Kurdî û guvendên komî tên lidarxistin.

تقعُ في باكورَ كردستانَ بين السُّهولِ والجبالِ، قربَ نهرِ دجلةَ العظيمِ، وبقربِها قلعةُ حصنِ كيفا القديمةُ. الأراضي حول باتمان سهولٌ واسعةٌ صالحةٌ للزِّراعةِ؛ يزرعُ المزارعون فيها: القمحَ، والشَّعيرَ، والقُطنَ، كما توجدُ بساتينُ الرُّمَّانِ، والتِّينِ، والعنَبِ، وفي السُّهولِ القريبةِ، تكثرُ الأرانبُ البريَّةُ، والثَّعالبُ، والغِزلانُ.

الأطفالُ يحبُّون التنزُّهَ قربَ نهرِ دجلةَ، واللَّعبَ في الحدائقِ، وزيارةِ المواقعِ التَّاريخيَّةِ مع مدارسِهم. فتقامُ احتفالاتٌ شعبيَّةٌ مع الموسيقا الكرديَّةِ، والرَّقصاتِ الجماعيَّةِ.




# Qitik

## طائرُ القَطا



***Di herêmên çolistanî û deştên zuha de jiyan dike, basikên wê dirêj û tûj in ku alîkariya wê di firînên dur û bi lez de dikin; da ku li xwerin û vexwarinê bigere.***
***Dema avê dibîne, pirça sînga xwe bi avê şil dike, piştre vedigere hêlîna xwe ku zarokê xwe ji wê ava pirça xwe, av dide! Rêbazekî biaqil e ku alîkariya biçûkan dike ku di cihên zuha de bimînin.***

يعيشُ في المناطقِ الصَّحراويَّةِ، والسُّهولِ الجافَّةِ، لهُ أجنحةٌ طويلةٌ، ومدببةٌ، تساعدُه على الطَّيرانِ مسافاتٍ بعيدةً بسرعةٍ؛ بحثًا عن الماءِ والطَّعامِ. وعندما يجدُ الماءَ، يبلّلُ ريشَ صدرِه بالماءِ، ثم يعودُ إلى عشِّه، فتشربُ صغارُه الماءَ من الرِّيشِ! إنَّها طريقةٌ ذكيَّةٌ تساعدُ الصِّغارَ على البقاءِ في الأماكنِ الجافَّةِ.





# Vexwerinên xwezayî

# المشروباتُ الطَّبيعيَّةُ



Hevalên min ên biçûk, gelo we qet ji xwe pirsî ye çima her tim ji me re tê gotin ku em sebzeyan bixwin?
Ji ber ku di sebzeyan de ji bo laşê me gelek feydeyên mezin hene!
Gêzer… dostê çavan e.
Îspenax... masûlkeyan xurt dike.
Bacanê sor... parastinê peyda dike.
Xiyar... laş teze dike.
Ji ber wê hevalê min! Were em her roj sê cureyên cuda ji sebzeyan bixwin, da ku tu jî bibî dostê sebzeyan.

محضَّرةٌ من الفواكهِ الطَّازجةِ، تَمنحُ الجسمَ طاقةً تساعدُ الأطفالَ على اللَّعبِ بنشاطٍ طوالَ اليومِ؛ لأنَّها تحتوي على كميَّةٍ كبيرةٍ من الماءِ، لذلك تساعدُ الجسمَ على البقاءِ منتعشًا، خاصَّةً في الأيَّامِ الدَّافئةِ.
ومن الأفضلِ، يا أصدقاءُ، أن نشربَ العصيرَ الطَّازجَ من الفاكهةِ الَّتي في البيت، لأنَّهُ صحيٌّ أكثرَ من العصائرِ المعلَّبةِ، الَّتي قد تحتوي على الكثيرِ من السُّكَّرِ.







# Di tabloya jêrîn de li van peyvan bigerin




**Serî _ Por _ Çav _ Mijank _ Guh _ Poz _ Dev _ Ziman _ Diran**





| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| s | e | r | î | z | m |
| p | o | r | g | i | i |
| Ç | a | v | u | m | j |
| p | o | z | h | a | a |
| D | e | v |  | n | n |
| D | i | r | a | n | k |









# Mizgîn

# مزكين

***Şehîd Gurbet Aydin ku bi navê (Mizgîn) naskirî ye, di sala 1962'an de li gundê Bileyder ê bajarê Batmanê li Bakurê Kurdistanê ji dayik bûye. Di hawîrdoreke Kurdewarî ku bi çanda Kurdî girêdayî ye mezin bû. Ji zarokatiya xwe ve ew bi huner û folklura gelêrî ve hatibû girêdan. Di sala 1980'î de tevlî Tevgera Rizgariya Kurdistan bû, piştre derbasî Ewropayê bû û bi hevalên xwe yên hunermend re Koma Berxwedan a hunerî ya ku gelek stranên şoreşgerî û welatparêzî pêşkêş kirine, avakirin.***
***Ji ber ku hunermend aşiqa welat û azadiyê bû vegeriya welêt û têkoşîn kir, heyanî sala 1992'an ku gihîşt asta şehadetê. Bi vê yekê mîrateyeke hunerî yên giranbuha li şûn xwe hêşt. Ji stranên wê yên herî navdar:***
***Lo Hevalo _ Çemê Hêzil _ Gundîno Hawar***

ولدت الشهيدة غربت آيدن المعروفة باسم (مزكين) عام 1962 في قرية بليدر التابعة لمدينة باطمان بباكور كردستان, نشأت في بيئة كردية مهتمة بالثقافة الكردية فمنذ صغرها ارتبطت بالفن والفلكلور الشعبي, في عام 1980 انضمت إلى حركة التحرر الكردستانية, ثم سافرت إلى أوروبا وأسست مع رفاقها الفنانين فرقة برخدان الفنية والتي قدمت أغاني ثورية ووطنية كثيرة.
ولأن الفنانة تعشق وطنها والحرية عادت إلى الوطن وناضلت حتى ارتقت إلى مرتبة الشهادة عام 1992م؛ لتترك إرثاً فنياً مميزاً.
ومن أشهر أغانيها:
Lo Hevalo _ Çemê Hêzil _ Gundîno Hawar

# Hin Navên bi tîpa - L

Laleş

Lava

Loriştan

Leylan

Lîlav

Lewend

Lîloz

Lorîn

***Bi destpêkirina demsala havînê re; pêdiviya çûk û lawiran ji ber germahiya bilind, zêde bi avê çê dibe; ji ber vê yekê, em dikarin bi danîna taseke piçûk a avê li ser balkonê an jî nêzîkî daran alîkariya wê bikin, bi guhertina rojane ji avê re da ku her tim paqij be.***

**Herwiha em dikarin şitileke biçûk biçînin, ji ber ku nebat hewayê nerm dikin û perperîkên xweşik dikşînin.**



مع بدايةِ فصلِ الصَّيفِ؛ تزدادُ حاجةُ الطُّيورِ والحَيَوانَاتِ الصَّغيرةِ إلى الماءِ بسببِ الحرارةِ العاليةِ؛ لذلكَ يمكنُنا مساعدتُها بوضعِ وعاءٍ صغيرٍ من الماءِ على الشُّرفةِ أو قربَ الأشجارِ، مع تبديلِ الماءِ يوميًا ليبقى نظيفًا. ويمكنُ أيضًا زراعةُ نبتةٍ صغيرةٍ، فالنَّباتاتُ تُلطّفُ الجوَّ، وتجذبُ الفراشاتِ الجميلةَ.

**تذكّروا دائمًا: الأرضُ تبتسمُ لكلِّ طفلٍ يحبُّ الطَّبيعةَ، ويحافظُ عليها**

# Rêwîtiyek li gerstêrkan

# رحلةٌ إلى الكواكبِ

**Me ji hin hevalên xwe yên biçûk pirsî: Ger hûn biçin rêwîtiyekê li gerstêrkan, hûnê çi bikin? Bersiv;n wan gelek xweş bûn û tijî xeyal bûm!**

**سألنا بعضَ أصدقائِنا الصِّغارِ: ماذا ستفعلونَ لو سافرتُم في رحلةٍ إلى الكواكبِ؟ وكانتْ إجاباتُهم ممتعةً، ومليئةً بالخيالِ!**



## Jîndel Ciwan Mistefa (heşt sal)

## جيندل جوان مصطفى (ثماني سنوات)

Ew dibêje: **"Ger ez biçim gerstêrkan, ez ê ax û kevirên li wir lêkolîn bikim û wan analîz bikim da ku sirên wan bizanim!"**

تقولُ: **إذا سافرتُ إلى الكواكبِ، فسأدرسُ التُّربةَ، والأحجارَ هناكَ وأحلِّلها لأعرفَ أسرارَها!**




## Dilnaz Ciwan Mistefa (heşt salî)

## دلناز جوان مصطفى (ثماني سنوات)

Dibîje: **"Ez ê li şopa însanan bigerim, dibe ku li ser gerstêrkan jiyan kiribin!"**

تقول: **أبحثُ عن آثارِ أُنَاسٍ، ربَّما عاشُوا في الكواكبِ!**

# Çîroka : Rojek Li Gund




Hahaha… perperîk… perperîk
Ez texmîn dikim ku masî di kaniyê de li benda me ne haha
Waw…. Çiqas bedew e ev cih
Av hênik û xweş e
Ooooh…. Kevir biryar da ku avjeniyê bike haha


Hevalê min Dara…. Ev lîstika avêtina avê ye hahaha


Kê tav vemirand?
Ne ez


Baş bif bikin ewr wê bilive haha
Ya baş em vegerin gund, we çi got?






Xox

خَوخٌ


Plums



Enenas

أنَانَاسٌ


Pineapples



Gêlaz

كَرزٌ

Cherries



Tirî

عِنَبٌ

graps

# Çavika Mizgîn
# عدسة مزكين



مجاناً

15-حزيران- 2026

# مزكين

العدد - 208

